## Сәрньвисар

Мәсиһийеда Ньвисара Пирозә мьләте щьһуйар’а те готьне Пәймана Кәвьн. Пәймана Кәвьн т’әмамийа хwәва 39 к’ьтеб ьн, к’ижан кӧ бь дәсте гәләк ньвиск’ара һатьнә ньвисаре. Гәләк жь ван к’ьтеба бь зьмане щьһутийа бәре һатьнә ньвисаре. Һьнәк п’аред к’ьтеба Пәймана Кәвьн се һ’әзар сала зедәтьр ьн кӧ һатьнә ньвисаре. Пәймана Кәвьнда һәнә к’ьтебед дирок у qануне, һьлбәста, ширәтед мәрьвед сәрwахт у п’ехәмбәртийед кӧ тенә сери. Әвана һаqаси щур’ә-щур’ә бун, ле фькьред wан һ’әмуйа жи сәр нетәке бу, аwа готи бона һәләqәтийа Хwәдейә т’әви мьләте щьһу. Мәрәме Wи әw бу, кӧ әw дӧайе хwә сәр һ’әму мьләтада бьбаринә к’ижан кӧ wи баwар бькьн у гӧһдарийа wи бькьн.

Жь ван кьтеба, се к’ьтебед Пәймана Кәвьн, щара пешьн бь зьмане к’ӧрдийа кӧрманщи, алийе Института wәлгәр’андьна Библийайеда һатьнә

## Sernivîsar

Mesîhîyêda Nivîsara Pîroze miletê cihûyar'a tê gotinê Peymana Kevin. Peymana Kevin t'emamîya xweva 39 k'itêb in, k'îjan ku bi destê gelek nivîsk'ara hatine nivîsarê. Gelek ji van k'itêba bi zimanê cihûtîya berê hatine nivîsarê. Hinek p'arêd k'itêba Peymana Kevin sê h'ezar sala zêdetir in ku hatine nivîsarê. Peymana Kevinda hene k'itêbêd dîrok û qanûnê, hilbesta, şîretêd merivêd serwaxt û p'êxembertîyêd ku têne sêrî. Evana haqasî cûr'e-cûr'e bûn, lê fikirêd wan h'emûya jî ser nêtekê bû, awa gotî bona heleqetîya Xwedêye t'evî miletê cihû. Meremê Wî ew bû, ku ew duayê xwe ser h'emû miletada bibarîne k'îjan ku wî bawar bikin û guhdarîya wî bikin.

Ji van kitêba, sê k'itêbêd Peymana Kevin, cara pêşin bi zimanê k'urdîya kurmancî, alîyê Înstîtûta welger'andina Bîblîyayêda hatine

wәлгәр’андьне. Әвана щур’е qәwьмандьна ньвисара щьһуйайә пирозә кәвьн бәрбьч’ә’в дькьн. Әв һәр се к’ьтеб нава хwәда се дәмед башqәйә дирока щьһуйа дьдьнә к’ьфше, жь qӧр’на 11-да һ’әта qӧр’на 15-а бәри буйина Иса. Әв wәлгәр’андьн жь канийа ә’саси һатийә һьлдане, awa готи т’әви тек’ста Ибрани һатийә р’убариһәвкьрьне.

Әм ве йәкеда гӧман ьн, кӧ хwәндәванед к’ӧрд, ве к’ьтебеда нә кӧ we т’әне дирока сәрһатийед һ’әйрә-һ’ӧжмәк’ар бьбиньн, ле бәле ӧса жи we р’астийа Хwәдейә һьндава мерьвда бьһ’әсьн.

Институт р’азибуна хwә дьдә wәлгәр’ у сәрр’асткьред ван к’ьтеба.

*Хәбатк’аред Института Wәлгәр’андьна*
*К’ьтеба Пироз*

welger'andinê. Evana cûr'ê qewimandina nivîsara cihûyaye pîroze kevin berbiç'e'v dikin. Ev her sê k'itêb nava xweda sê demêd başqeye dîroka cihûya didine k'ifşê, ji qur'na 11-da h'eta qur'na 15-a berî bûyîna Îsa. Ev welger'andin ji kanîya e'sasî hatîye hildanê, awa gotî t'evî têk'sta Îbranî hatîye r'ûbarî-hevkirinê.

Em vê yekêda guman in, ku xwendevanêd k'urd, vê k'itêbêda ne ku wê t'enê dîroka serhatîyêd h'ey-re-h'ujmek'ar bibînin, lê belê usa jî wê r'astîya Xwedêye hindava mêrivda bih'esin.

Înstîtût r'azîbûna xwe dide welger' û serr'astkirêd van k'itêba.

*Xebatk'arêd Înstîtûta Welger'andina*
*K'itêba Pîroz*